

# Berbang

ORGANA FEDERASYONA KOMELEYÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

Hejmar: 95, Nîsan 1994

Fax: (46) 08-650 21 20

Tel: (46) 08-652 8585

## Lissy hat kuştin

baran1xalit12xoce123



Lissy (Elizabeth Schmidt) Rojnamevana Almanî  
li Kurdistanê bi cî bûbû

rûpel 5

Parlamentê "Center" Pär Granstedt :

-Rewşa Kurdan ya li rojavayê Asya-  
yê di eslê xwe de, trajediyeke nete-

.....  
raramenûoya swêdê dîsa pîrsa kurd  
munaqêşe kir **rûpel 6**

JINÊN KURD KÊM BEŞDARÎ  
JIYANA CIVAKÎ DIBIN

Mencê Aldûr endama Komîteya Giştî ya  
FKKS di nav jinên Kurd li Spångayê de  
lêkolînek pêk anî. **rûpel 2**

Di pêşberkeya fûtbolê de  
Ararat bû yekem

Çalakiyên Komeleya Kurd li Eskils-  
tunayê **rûpel 6**

Hilbijartinên li Tirkîyê serê  
dewletê diêşîne

Dewletê ji bo ku Kurd beşdarî hilbijartinan  
bîbin, bi dizî û eşkere, her îmkanên xweyên  
zorê, li her aliyê welêt bi kar anî. **rûpel 2**

Filimê kurdi  
"KILAMEK JI BO BEKO"  
li sinemaya Stockholmê **rûpel 5**

Kurdên Gävleyê meşîyan û Dewleta Turkiyeyê protesto kirin

rûpel 4



## Hilbijartinên li Tirkîyê serê dewletê diêşîne

Di hilbijartina serokatiya belediyên û meclîsên belediyeyan û meclîsa wîlayetan de pêşketina dengên Partiya Refahê ya serbi dîtinên Îslamî ve di rojêva tirkîyeyê ya politik de cihêkî taybetî girt û wa diyar e, zû bi zû jê danakeve.

(13) Sêzde partiyên siyasî beşdariya hilbijartinan kirin. Ji derveyî partiyên siyasî gelek kesên serbixwe jî li devêrên cihê bûne namzedên serokatiya belediyên û beşdarî hilbijartinan bûn.

Bi gelemperî belavbûna dangan li gora dengwergirtinê weha ye.

DYP-(Partiya di bin serokatiya Tansu Çiller de) %21.4

ANAP (Bi serokatiya Mesut Yilmaz) %21.0  
 RP (Bi serokatiya Necmeddin Erbakan) %19.0  
 SHP (Bi serokatiya Murat Karayalçin) %13.5  
 DSP (Bi serokatiya Bulent Ecewîr) %8.8  
 MHP (Bi serokatiya Alparlan Türkêş) %7.9  
 CHP (Bi serokatiya Deniz Baykal) %4.6  
 BBP (partiya Yekitiya Mezin) %1.3  
 DP (Partiya Demokrat ya Kurê Adnan Menderes) %0.50

MP (Partiya Gel) %0.42  
 YDP (Partiya Demokrasiya Nû) %0.37  
 SBP (Partiya Yekitiya Sosyalîst) %0.29  
 IP (Partiyên Karkeran) %0.28

Di jiyana hilbijartinên li Tirkîyê de hilbijartinên 27-ê Adara 1994-an xwediyê taybetmendiyên ku cara yekem hilbijartineke weha di binê bandora medyayê de pêk hatinê ye. Bi rojname û TV piştgirî û agahdarî gav bi gav dihate belavkirin.

Di encama hilbijartinên 27-ê Adarê de gelek tiştên giring rû dan.

-Giraniya Kurdan, nebeşdarbûyina wan û pirsên bi Kurdan ve girdayî di rojêva hilbijartinan de cihêkî giring dadigirt. Wa diyar e ku di pêşerojê de, ew ê hê jî xebardan li ser bê kirin.

-Bi dengwergirtina Partiya Refahê (RP) ya ser bi Îslamî ve herkes mat ma. Dihate texmîn kirin ku ev partiya ha ew ê dengên xwe zêde bike, lê ne bi vê ecêba ha. Ji ber vê yekê jî bû hilbijartineke pirsnişanan.

-Di van hilbijartinan de digel ku aboriya Tirkîyeyê di halekî gelek xerab de ye jî pere weke avê hatin xerçkirin. Ava êş diyar e ji rûbarên mezin diherike.

-Hilbijartinan diyar kir ku Tirkîye ne xwediyê sistemeke nûjen ya hilbijartinê ye.

-Birêvebirina politikayê li Tirkîyeyê bi vî rengî êdî nameşe.

-Partiyên siyasî ne xwediyê pêşniyarên çareserkirina pirsgrêkên heyî bûn.

-Dûmana listik û zexeliyên di hilbijartinan de hatin kirinê hilkişiya esmanan.

-Dinya bi semt li rewşa Tirkîyeyê ya piştî hilbijartinan temaşe dike.

-Danustendina di navbera partiyên siyasî û serokên dewletê de û ya partiyên siyasî nav xwe de ragirti ye.

-Heta hilweşandina hukûmê jî bu babetê xebardanê.

Li gora hilbijartinên di sala 1991-ê de pêk hatin; Partiya Rêya Rast (DYP-tirkî) ya seroka wê Tansu Çiller e, digel partiya sosyaldemokratîk ya gel

(SHP) hukûmeta îro bi rêve dibin, bi partiya Niştîman (ANAP) re ji aliyê dengwergirtinê ve cihê xwe guhertin. Partiya Sosyal Demokrat ya Gel (SHP)- dengên xwe daxistin nêvî. Lê partiya Refahê (RP) ducaran li dengên xwe yê sala 1991-ê deng wergirt. Li bajarên mezin Istanbûl, Ankara, Konya û nêzî 30 parêzgeh û gelek deverên din, serokatiya belediyên wergirtin. Li gora pispors û mopizanên hilbijartinan ye Tirkîyê, beşdarnebûna Partiya Demokrasiyê (DEP)- bi kêrî partiya serbi Îslamî hatiye, hem Kurdan û hem birrên ji birêvebirina siyaseta Tirkîyeyê ya îro zivêr bûn, dengên xwe danin Partiya Refahê.

Di gel ku hereketa Îslamî ya li Tirkîyeyê bêtir hereketa musulmanên sunnî xuya dike jî li cihanê, welate rojava û "DYA"yê (Dewletên Yekbûyî ya amerîka) encama hilbijartinên li Tirkîyeyê perçeyek jî xurtbûyina tevgera Îslamî hatê dîtin- ne tenê li Tirkîyeyê her weha li derveyî Tirkîyeyê jî yê ji encamê hilbijartinan natmayî manin gelek in...

Ji xwe sextekariyên ku di hilbijartinan de hatine kirin gelek êşkere ne. Piştî hilbijartinan bi deh rojan jî kaxetên mohrkirî û sindokên hilbijartinan di çopên bajarên û li derve avêtî û niv-şewîti hatine dîtin û ji bo îptalkirina hilbijartinan bi taybetî Partiyên Siyasî yê kêm deng wergirtine yan yê bi hindik dangan di hilbijartinan de kêm ketine, teslîmî merkeza encûmena hilbijartinê ya bilind kirine û doza îptalkirina hilbijartinan bi tevayî hatiye kirin.

Li Kurdistanê hilbijartina 27-ê Adara 1994-an bi serê xwe babeta gelek nivîsandinan e.

-Kurd di hilbijartinan de bê alternatîf bûn.

-Partiya Demokrasiyê (DEP) jî hilbijartinan vekşiya. Bi navê Kurdan beşdarî nebû, ji xwe rê lê hatibû girtinê.

-Beşdarî ya hilbijartinan li Kurdistanê digel zora dewletê kêm bû. Gelek dengên spî (nelê) hatin bikaranîn.

Li Diyarbekirê serokatiya Belediyeyê kete destê namzedê Partiya Refahê.

Li gora dangan û beşdariyê mirov lê hûr bibe, serekê Belediyeyê Diyarbekirê (%12) ji sed dengî bi duwanzdeh dangan hatiye hilbijartin.

Dewletê jî bo ku Kurd beşdarî hilbijartinan bibin, bi dizî û êşkere, her îmkanên xweyên zorê, li her aliyê welêt bi kar anî. Bi destên leşkeran û (Istixbaratê) parastinê, partiyên ku heta nuha piyên wan bi Kurdistanê neketibûn, derketin pêş, buroyên wan hatin vekirin û ji wan re bi zorê li dangan peydar bûn. Cihên ku kes beşdarî hilbijartinan nebûne bi 25-30 dangan serokê Belediyeyan hatine hilbijartinê. De êdî hûn hesab bikin bê hilbijartinên 27-ê Adara 1994-an çendî durust û demokratîk e.

## JINÊN KURD KÊM BEŞDARÎ JIYANA CIVAKÎ DIBIN

Mencê Aldur endama komîteya giştî ya FKKS ku endama Komeleya Kurd li Spångayê ye lêkolînek di nav jinên Kurd li Spångayê de pêk anî. Babeta lêkolîna wê li ser ku jinên Kurd kêm beşdarî jiyana civakî dibin, bû.

Anketeye ku ji heft (7) pirsan pêk hatibû bingehê vê lêkolînê bû. Pirs ev bûn:

- 1- Tu çend salî yî?
- 2- Ma Tu zewicî yî?
- 3- Ev çend sal in ku tu li Swêdê yî?
- 4- Ma tu endamê komeleya kurdî yî?
- 5- Çima Tu naçe komeleyê?
- 6- Tu komeleyeke çawa dixwazî?
- 7- Gelo tu Komeleya Kurd li Spångayê çawa dibînî?

24 jin beşdarî hevpeyvîna lêkolînê bûn.

Ji 24 jinan 6 jin di di navbera 4-8 salan e ku li Swêdê ne.

Ji 24 jinan 18 jin di navbera 9-17 salan ku li Swêdê ne.

Ji 24 jinan 20 jin zewicîne.

Ji 24 jinan 4 jin nezewicîne.

Ji 24 jinan 17 jin endamê komeleya Kurd li Spångayê ne.

Ji 24 jinan 7 jin ne endam in.

Jinên ku beşdarî vê hevpeyvîna bûn temenê wan di navbera 23 û 47 salan de bû, lê temenê pîrriya wan ji 30 ta 37 salan bûn.

Ji encama pirsan diyar bû ku 4 jin baweriya xwe bi komeleyên kurd li Ewropa yê nînin û komeleyên li Ewropayê tiştêkî nadin wan.

14 jinan digotin:

"Ji ber ku jin li Komeleyê nînin em naçinê, komele ji bo jinan teştêkî nake" digotin "em xwe li komele rehet nabînin"

6 jinan di bersivên xwe de digotin: "Wextê me yê vala nîne"

3 jinan Komeleyeke tenê ji bo jinan dixwestin daxwaza 20 jinan hema hema wekhev bûn.

Komele pêwîst e di vekirina kursên ziman ji bo zarokan, jinên endam û di hevdîtina (kal) pîr an de aktiv be. Komele ji hemû kesî re vekiribe û pêwîst e jin mîr ciwan û pîr bi hev re bin. Divê zarok û jin jî li komele xuya bikin. Divê komele ji rewşa kurdan ya li welêt agahdar be û li hember kuştinan bêdeng nemîne.

Mencê Aldur

## Qaîdeyên ji bo wergirtina destûra rûniştinê nermtir dibin

Biyaniyên bi kesên ku li Swêdê destûra wan î rûniştinê hene re zewicî ne an dixwazin bizewicin, divê ji bo muracaeta destûra rûniştinê, berê Swêdê terk bikin û piştî karûbarên wergirtina destûra rûniştinê qediya, vegerin Swêdê. Lê mîna hemû qaîdeyên din, ev qaîde jî dike bê guhertin.

Wezîra Karûbarên Kulturê Birgit Friggebo di daxuyaniyêke pressê de behsa vê qaîdeyê kir û da diyarkirin ku Hukûmet dixwaze qaîdeyên di vî warî de nermtir bike da ku kesên di vê rewşê de ne, bikaribe bê ku mecbûrî ji Swêdê derketinê bibin, muracaeta xwe li vir bikin. Hukûmetê jî bo amadekirina pêşniyarên di vî warî de, komîsyonek tayin kiriye û ev komîsyon dê ji bo nerrn-kirina qaîdeyên di vî warî de pêşniyarên xwe amade bike.

### BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê

Xwedî:  
Vildan Tanrikulu

Berpisîyar:  
Heme Kerîm

Redaksiyon:  
Mustafa Aydoğan  
Cemal Batun  
Behroz Kurd Ehmedî

Destê Hevkarên:  
Hemîd Kiliçarslan  
Sîdîqî Hîrorî  
Nasîr Sînan  
Dara Rauf

Karû Teknikî  
Dylan Dersim  
N. Kirîv  
Bubê Eser

Navîşan  
FKKS-Berbang  
Box:490 90  
100 28 Stockholm  
Tel: 08-652 85 85  
Fax: 08-650 21 20  
Postgîro: 64 38 80-8

Federasyona komelên Kurdistanê li Swêdê di roja 6.6.1981'an de hatiye damezrandin.

Hejmarî Yekemî Berbang di mîha 7'an ya 1982'an de belavbûye.

## NEWROZA 1994-an û Çalakiyên Komîteya Kulturê

Federasyona Komeleyên Kurdistanê newroza îsal di bin însiyatîva Komîteya Kulturê de, li "Solna Hallen"ê bi beşdariya nêzikî 3000 mirovan pîroz kir. Komîteya Karger ya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ji bo amadekirina şevê, komîteyek bi navê "Komîteya Newrozê" ku bi Komîteya Kulturê ve girêdayî damezrandibû. Şev bi programeke dewlemend, ji saet 17.30-an heta saet 12.00-an dewam kir. Dengbêj û muzîsyenên ku beşdarî şevê bûbîn ev in: Tehsîn Taha, Fûad Ahmed, Feqiyê Teyra, Nasir Rezazî û Seîd Yusuf. Grûpa Helebçeyê, Grûpa Şilan ya folklorê û skêça ku Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê li Swêdê pêşkêş kir, yek ji wan bûyerên ku divê bê bi navkirin. Di şevê de, li ser navê Federasyonê Ahmed Karamus axaftinek kir. Endamê Konseya Rizgariya Neteweyî ya Başûrê Kurdistanê Samî Abdurrahman, nûnerê Buroya li Swêdê ya Hukûmet û Parlamentoya Başûrê Kurdistanê Arî Nûrî Reza, Parlamentera Partiya Çep û çîgirê serok a Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên mirovî yên Kurdan Berith Eriksson û parlamentoya Partiya Gel ya Lîberalan û seroka Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên Mirovî yên Kurdan Ingela Mårtensson jî di şevê de peyivîn. Ingela Mårtensson û Berith Eriksson piştigiriya xwe ya ji bo parastina

deskeftên neteweyî dan diyarkirin û newroza Kurdên li Swêdê pîroz kirin. Samî Abdurrahman li ser rewşa Başûrê Kurdistanê agahdarî da û hêvî û endîşeyên xwe yên di vî warî de anî zimên. Nûnerê Buroya Hukûmet û Parlamentoya Kurdistanê jî di axaftina xwe de li ser rewşa Kurdistanê rawestiya, karûnbarên ku Federasyon pê radibe pesinand û ji bo serkevtina Federasyonê piştigiriya xwe diyar kir.

Şev, di civîna Komîteya Karger de bi gelek awayan hat nixandîn. Komîteya Karger di civîna xwe de diyar kir ku ev şev li gel hinek kêmasiyên ku di civînê de jî hatin bi navkirin, hem ji aliyê beşdarbûnê, hem ji aliyê dewlemendiya programê û hem jî ji aliyê organîzekirinê, yek ji wan şevên serkevtî yên ku Federasyonê heta nuha amade kirine. Federasyon, di radyoya Spångayê de, li ser spekulasyonên ku di warê newroza 94-an de dihatin kirin, rawestiya û bersiva pirsên guhdaran da.

Em hêvî dikin ku her beşdarê beşdareke şevê, ji bo ku newrozê pêşerojê bi awayekî hîn bi rêk û pêkêr bêne organîzekirin û pîrozkirin, de kêmasiyên me rexne bikin û pêşniyarên xwe yêb di vî warî de pêşkêşî komîteya Kulturê ya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê bikin.

Komîteya Newrozê û Komîteya Kulturê de rapora xwe ya di derheqa şevê de amade bikin û pêşkêşî civîna Komîteya Giştî ya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê bikin.

Filmê şevê jî aliyê kameramanekî profesyonel ku li

televîzyona Sundsvallê kar dike ve, bi çar kamerayan û jî çar hêlan ve hat kişandin. Federasyon de kasetên şeva newroza 1994-an piştî qedandina karûbarên teknîkî, ji bo firotinê derxîne piyasayê.

# Ji bona amadekirina şeva Newrozê her nû endamên komîteyê bi aweyekî aktîv beşdarî kirin û karên xwe bi berpirsiyarî bi çîh anîn.

# Li ser daxwaza Komeleya Uppsalayê hunermend Tehsîn Taha û Fûad Ahmet di şeva wan da me da amade kirin û bi vî awayî reneke din dan şeva Uppsalayê.

# Li ser daxwaza Komeleya Eskilstunayê bi sekretêrê Federasyonê re beşdarî şeva wan bûn û li wir karê ku ket ser milên wan, bi dixweşî pêk anîn.

# Filmê şevê û herweha ji bona agirê newrozê yê ku ji aliyê Komeleya Spångayê ve hatibû dadan, hat girtin.

# Endamên Komîteya Kulturê yên ku navên wan li jêr hatine nivîsandin, karên amadekirina şeva newrozê bi çîh anîne:

Murat: Afîş, kartên ji bona parêzgeran û girtina filmê û hwd.

Seîd Zengene: Bi karê teknîkî ve mujul bû.

Aso Germiyani: Ji birêvebirina kar û barên parastinê berpirsiyar bû.

Munewer: Yek ji spîkerên şevê bû.

Ez wek berpirsiyarê komîteyê, hemû hevalan bi dil û can pîroz dikim û ji bo wan serfiraziyê dixwazim.

Selam Cizîrî  
Berpirsiyarê Komîteya Kulturê

### Komeleya Umeâyê

Komeleya Kurd li "Umeâ" yê di 12.03.1994-an de şeva newrozê çekir. Gelek Kurd û swêdî beşdarî vê şevê bûn. Wek dengbêj Delal di şevê de amade bû. Şev bi şahî û govendê geş bû û heta derengê şevê dewam kir.

### Komeleya Huudiksvallê

Komeleya Kurd li Hudiksvallê di 19.03.1994-an de ahenga newrozê amade kir. Hejmareke mezin ya rûniştvanên bajêr beşdarî şevê bûn. Grûpa muzîkê ya Komeleya Kurd li Huddiksvallê bi hunerên xwe ve şevaheng xwestir kir.

### Komeleya Sundsvallê

Di 26.03.1994-an de cejna newrozê pîroz kir. Gelek rûniştvanên bajêr, mêvan û Kurdên li derûdorê di şevê de amade bûn. Di ahengê de Delal û Necme mîna goranîbêj amade bûn.

## AGAHDARIYA DAÏREYA BIYANIYAN

### DI 1994-95-an de PRENSÎPÊN ALÏKARÎWERGIRTINÊ

Daïreya Biyanîyan (Invandrarverket), alîkariya projeyên ku xebatê bi pêşve dibe û metodên nuh bi kar tîne, dike da ku:

# Di navbera gelan û grûpan de alîkariya peydakirina toleransê bike û ji hevûdû tê bigihîne.

# Jiyanê Komeleyatiyê ya biyanîyan bi pêş keve û komeleyên biyanîyan di nav civata Swêdê de çîhê xwe bigrin û fonksiyona xwe bilizin.

# Alîkariya penaberên ku dixwazin vegezin welatê xwe bike û şertên wan yê vegeerê amade bike.

Komeleyên biyanîyan, rêxistinên îdeel yê mirovatî, olî û sendîkayî dikarin projeyan pêşkêşî Daïreya Biyanîyan bikin û alîkariyê bixwazin. Daïreya Biyanîyan hin çar alîkariyê dide projeyên belediyan û yê daïreyên res-

mî yê ku bi hevkarîya rêxistinanan ve amade bûne.

Projeyên ji bo daxwaza alîkariyê, herî dereng heta 30.06.1994-an dive bighêje Daïreya Biyanîyan. Serlêdanên bi derengî qebûl nabin.

Organîzasyonên merkezi dikarin ser li SIV'ê (Statens Invandrarverket) û yê herêmî û lokal jî serlêdanên xwe bişînin bûroyên Avesta, Mølndal, Flen û Sundsvallê.

#### RAPORA PROJEYÊ (REDOVISNING)

Rapora xebatê, herî dereng (3) mehan piştî serlêdanê divê ji Daïreya Biyanîyan re bê şandin. Rapor, divê bi qencî û xerabiyên xwe ve amadekirî be. Her weha divê rapora aborî ya projeyê alîkarî wergritiye, neyê şandin Daïreya Biyanîyan ji bo projeyek nuh jî alîkariyê nade.

#### JÏ BO PROJEYÊN BI BÂBETÊN LI JÊR RÊZKIRÎ VE GRÊDAYÎ ALÏKARÎ TÊ DAYIN:

1- Di warê tesîr li opinyonê û mirovan kirinê de

# Di navbera GEL'an û grûpan de, danasîn û nezîkî-hevkirina kultura wan, # alîkariya biyanîyan, ya ji bo beşdarbûyina wan a karê komeleyatî,

# Belavkirin û di berçavan re derbaskirina tecrubeyên xebatên wan,

2- Di warê pêşdexistina jiyana komeleyatî di nav biyanîyan de û beşdarkirina wan ya di nav civata swêde de. Ji bo:

# Xebatên nûh di nav komeleyên biyanîyan de.

# Xebatên kulturî û civatî.

# Rêxistinên merkezi (RISK) yê ku wek organîzasyon alîkariyê wernagirin.

# Grûpên nuh û hewcedarên alîkariya çapemeniyê.

3- Li ser vegera penaberan.

# Ji bo alîkarî û serwestkirina penaberên ku dixwazin vegezin welatê xwe û danasiya mafên wan.

#### MERCÊN ALÏKARIYA PROJEYAN

# Divê, proje bi xebata hevbeş ya biyanîyan be.

# Divê proje ji hêla organi-

zasyon û hevbeşên xebata wan ve hatibe zelalkirin û birêxistin.

# Dive armanca projeyê, bi netice û tecrubeyên xwe, di xebata komeleyan ya daîmî de çîh bigre.

# Dive proje di dema sînorkirî de hatibe şandin û mesrefên projeyê bi sînora be û hatibe kifşkirin.

# Dive organîzasyonên xwe-diyê projeyê di serlêdana xwe de veqetandina tibaba projeyên ji bo projeyê û tibaba pereyên ji Daïreya Biyanîyan dixwaze eşkere bike.

#### ALÏKARÎ NAYÊ DAYIN, JÏ BO..

# Kesan

# Xebatên ji bo carekê yê di pêş de di xebata daîmî de ne xwedî fonksiyon bin.

# Xebatên daîmî

# Xebatên ji bo li derveyî Swêdê û mesrefa çûyîn û hatinê.

# Xebat û projeyên ku ji hin cihên din alîkariyê wergirin.

# Xebatên ku berê hatine tecrubekirin.

# Zêdekirina meaşên kesan.

Blenketên ji bo serlêdana alîkariyê û rapora xebatê ya projeyan dikarin ji Daïreya Biyanîyan bèn Daxwazkirin

KOMÏTEYA PERWERDE

ADRESÊN DAÏREYA  
BIYANIYAN (STATENS INVANDRARVERK)

STATANES INVANDRARVEK  
Verksamhetsnheten,  
Integrationsgruppen  
Box: 6113  
600 00 NORRKÖPING

REGION NORD  
STATENS INVANDRARVERK  
Regionkontoret i Sundsvall  
Box 816  
851 23 SUNDSVALL

REGION SYD  
STATENS INVANDRARVERK  
Regionkontoret i Alvesta  
Box 505  
342 23 ALVESTA

REGION ÖST  
STATENS INVANDRARVERK  
Regionkontret i Flen  
Box 134  
642 23 FLEN

REGION VÄST  
STATENS INVANDRARVERK  
Regionkontoret i Mølndal  
Box 194  
431 23 MÖLNDAL

# Ev agahdarî ji Daïreya Giştî ya Karûbarên Biyanîyan (STATENS INVANDRARVERK) hatiye wergirtin.


## NEWROZ Û ÇALAKIYÊN KOMELEYA KURD LI GÄVLEYÊ

Di roja 19-ê Adara 1994-an de şayî û pîrozkirina cejna Newrojê li salona Folket Husê hate pîrozkirin. Runîştvanên bajarên Gävleyê bi yê Sundsvälê û bajarên der û dorê beşdarî ve şevahenga bûn.

Hûnermendên deng-xweş Cûdî û Mîkayil bi dengên xwe yê xweş şevahenga Newrozê xemilandin. Her weha nûnerên rêxistinên Swêdî, komeleyên biyaniyan yê ku vexwendiyê Komeleya Kurd bûn, bi kêfxweşî beşdarî şevahengê bûn.

### Xwepêşandin li dijî Tirkiyeyê.

Di roja 26.03.1994-an de Komeleya Kurd li Gävleyê xwepêşandaneke li dijî kiryarên Tirkiyeyê ya li dijî gelê kurd û bi taybetî girtin û ji



deststendina îmmuniteta parlamenterên kurda, pêk anî.

Xwepêşandan bi bireveçûna yekrêzî di nav bajêr de dest pê kir û li meydana bajêr ya mezin bi kombûn û xwendina gotara Komeyala Kurd û mesajên Partiya Çep (VP) Partiya Jîngehê (MP) Komeleya kulturî ya Navneteweyî

(Int.Kul.för) û Komeleya Aştiyê (svensk-freds kom) xwendinê berdevam kir. Hemû rêxistinên ku beşdarî xwepêşandinê bûn, di gotarên xwe de kiryarên Tirkiyeyê mahkum kirin û piştgiriya xwe ji bo Kurdan diyar kirin.

### Pêşangehek

Di roja 29.03.1994-an

de pêşangehek wêneyan ji alî ciwanên kurd û swêdî vihat amadekirin. Di ve pêşangehê de jiyan li Kurdistanê (bi taybetî jiyan zarokan) bi wênê û nivîsandinan hate pêşkêşkirin. Du lawên kurd bi navê Kesmal Abbasî û Şoreş Qader ji alî Komeleya Kurd li Gävleyê amadekarê ve pêşangekê bûn.

## Komeleya Örebroyê

Geşkirina agirê Newroza 1994-an ji aliyê Komeleya Kurd li Örebroyê bi dadana agirê Newrozê û beşdariya gelek kurd û swêdiyên rûniştvanên bajarê me ve li Hästhagenê êvara Newrozê pêk hat. Di ve êvarê de Kurd bi xwendina sirûda Neteweyî "Ey Reqîp" û bi xwendina sirûda Newrozê û govendgirtina li dora êgir ber bi sala teze ve çûn. Herweha roja 27-ê Adara 1994-an şevahenga Newrozê bi beşdariya Kurdên rûniştvanên örebro û bi beşdariya gelek swêdîyan ve li lokala komeleyê ve hate pîroz kirin. Di ve şevahengê de piştî gotara pîrozkirinê du şano ji alî yekitiya ciwanên komeleyê ve hatin pêşkêşkirin. Koro, srûd, stran, û govend wek hercar bûn xemla şevahenga me.

Berpirsyarê Kanala Televizyona bajarê Örebroyê ku beşdariya şevahenga me bûbû, piştî pîrozkirina cejna Newrozê ligel Kurda amadebûna xwe bo alîkarî û belavkirina programên di Televizyonê de gihand Komeleya Kurd. Ev saleke ku ev fersenda ji bo Komeleya Kurd li Örebroyê pêk hatiye ku programên cur be cur

di kanala televizyona Örebroyê de bête belavkirin.

Heta nuha çend bernameyên hunerî, siyasî, edebî li ser kasetan bi navê Komeleya Kurd tomakirî di van kanalan de belav bûye. Ya dawî ahenga dadana agirê Newrozê bû.

Komeleya Kurd li Örebroyê dikare programên xwe heftiyên du caran her carê saetekê bide belavkirin. Di vî warî de Komeleya Kurd li Örebroyê li hêviya alîkarî û piştgiriya herkesî ye.

Di roja 5-ê Nisana 1994-an de di hadiseya tirumbêlê de ku li Kurdistana Suriyeyê nêzikî Qamişliyê çebû (16) şanzdeh Kurdên suwarê tirumbêlê mirin û 12 kes jî birîndar bûn. Yek ji wan kesên ku wefat kir, Kek Salih Ebdurrehman ku endamê Komeleya Kurd li Örebroyê bû ku ji bo dîtina bavê xwe çûbû Suriyeyê. Kek Salih bi çendê salan di şoreşa başûrê Kurdistanê de pêşmerge bû. Di van salên dawî de ji bo dermankirina êşa çavên xwe ku di esnayê şerê li Kurdistanê de peyda bûbû, hatibû swêdê.

Ji bo Kek Salih Ebdurrehmanê ku jin û mindaleki (8) heşt mehî li pey xwe hişt du rojan li lokala Komeleya Örebroyê şûna serxweşiyê hate danîn.

## Komeleya Östersundê

\* Di 19.03.1994-an de Komeleya Kurd li Östersundê ji bo pîrozkirina newrozê ahengeke mezin amade kir. Nêzikî 400 kes beşdarî ve ahengê bûn. Di ve ahengê de li gel muzîka Swêdî û Kurdî hem govenda Kurdî û hem jî dan-

Kurdên(Xebat Osman û Helîme Hesên) ku endamê ve grûpê ne, xwendevanên ve sinifê nin. Bi van çalakiyan pêwendiyên di navbera xwendevanên Kurd û yê Swêdî germtir û xwestir bûn. Du rojnemeyên bajarê Östersundê; "Länstidningen, Östersunds-Posten" li ser van çalakiyan nivîsên dirêj belav kir û cih da wêne-

Orsdag 23 mars 1994

ÖP Orsdag 23 mars 1994



Di vî warî de bi om ett alverson i klass 6 A och 6 B på Kastalidolen i Brumfö hade roligt när dansgruppen "Hälsöbarns Folk" dansade ut kurdisk dans. Att dansa tillsammans är ett av de mer handfasta knopen att lära sig mer om andra kulturer.

sa Swêdî hate pêşkêşkirin. Grûpên muzîkê û hunermendên ku beşdarî ve ahengê bûn, ev in: Grûpa Östersundê "Huggade Harriets", Kawa, grûpa Gonçeya Helebçeyê, grûpa dansa Taylandî "Rammthai", goranîbêj Keyvan û orgjen Çiya û hwd.

\* Di hefteya newrozê de Kurdên Östersundê bi munasebeta hefteya pîrkulturî, bi Swêdî û mirovên ji neteweyên din re çalakiyên cur be cur li dar xistin. Yek ji van çalakiyan, ahenga 26-ê Adarê bû ku grûpa Gonçeya Helebçeyê ya ku ji 6 keç û kuran pêk hatibû, numûneyek ji muzîk û hunera Kurdî pêşkêş kir û dilê rûniştvanên bajêr germ kir. Grûpa Helebçeyê di ve navberê de, sinifa 6-an ya dibistana Östersundê fêrî govenda Kurdî kir. Du

yên çalakiyan.

Heftaya pîrkulturî ji sê salan û vir de tê amadekirin. Mebesta van çalakiyan ev e ku hemû mirovên ji neteweyên cuda bikaribin numûneyên ji kultura xwe pêşkêşî hevuda bikin. Piraniya rûniştvanên bajêr alîkariya komîteya amadekar ya hefteya pîrkulturî dikin. Yek ji birêvebirên hefteyê Ansa Nilsson e. Li gor wê pêşkêşkirina numûneyên ji kulturên cuda ji bo Swêdîyan hem îmkanek û hem jî pêwîstiyek e. Nilsson dibêje ku "Bi taybetî zarok divê kok û tradîsyonên xwe binasin. Divê ew bizanibin, bê ji kî derê hatin Swêdê. Ger mirov ji kok û tradîsyona xwe mehrûm be, dê hêviyên pêşerojê zêde ne xurt bin."

## XAÇEPIRS

Çeperast: 1-Keça Mitani bûka Fêr'ün 2. a) Dildarî b) Nelazim. 3. a) Bajarekî Kurd b)Derewîn 4.a)Avêtin, derew b) Çi kes 5.a) Roja buhurî (berevajî) b) Xeleka darînî ya stuyê dewar û kulbûna ji ber dêr 6.a) Altûn b) Xemla daristanê 7.a) Esil, kok b) Damar 8.a) Perçeyek seramik b) rengekî hespan 9.a) Tûrê bûye, acizbûye b) Pêşpirtikek biçûker 10. Komek, tibabek pez.

Serejêr: 1. a) roja nuh b) Cureyek rengê pez 2. Va ya yan awayekî navê Hewa b) bakirin 3.a) Zayendek segan, fes b) Sergen 4.a) Tîpa d bê pêşiyê dibe, kûp b)Ne esîle, şungir e 5. Ji hev nexist, girtî hişt , 6.a) Derhal, di cî de b) Li gor mala bavê keçên wan yê mêrkirî 7.a) Terikî ji hevcuyî b) Qiral, xudkar 8. a) Ne birçî b) Cih, şûn 9. a) Ne kovî (berevajî) b) Zencî 10.a) Tîp kom, (Frensî) b) Ji mirişkê ye, mirişk ji we ye. Qesra spî bê derî.

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

1									
2									
3									
4									
5									
6									
7									
8									
9									
10									

Bersîva xaçepirsê ya hejmara berê

F	E	D	E	R	A	S	Y	O	N	
E	R	Ê	N	A	I			D	E	
R	Ê		Î	M	A	M		E	M	
E	K	O	A	A	Û	I				
Z	I	M	A	N	D	I	R	Ê	J	
Î	R	E	M		B			E		
N	I	R	E	N	I	R	E	K		
		N	I	D	Ê		A	M	A	N
M		Y		R	O	N	Î		A	
Ê	V	A	R	Î		Î	N	Î		

# Lissy hat kuştin

**"Pêwîstiya demokrasîyê û aşîtiyê bi mirovên mîna Lissy heye."**

Lissy (Elizabeth Schmidt) Rojnamevana Almanî di 03.04.1994-an de ji aliyê ajanên Saddam ve hat qetilkirin. Bi Lissy re şofor û parezgerê wê jî hatin kuştin. Hukûmeta Federal ya Başûrê Kurdistanê bi munasebeta kuştina Lissy du kes girtin. Herdu kesên girtî îtîraf kirin ku wan Lissy Schmidt û şofor û parezgerê wê kuştine.

Lissy di 1990-î de ji aliyê polisên Tirkan ve tê girtin û bi alias Petra Leiner re ji Tirkîyê hat derxistin. Piştî ku Kurdan di 1991-ê de li Başûrê Kurdistanê beşekî axa xwe azad kir, Lissy di ser Sûriyeyê re û bi rêya dizî derbasî Başûrê Kurdistanê bû. Lissy di vê maweyê de Kurdî baş fêr bû û di warê zimên de tu problemê wê nemabû. Ji



Foto: Taner Bayrak

xwe Lissy ji dervayî Kurdî bi Tirkî û 8-9 zimanên din ji dika-rîbû biaxe. Ew bi redaksiyona radyoya "Merhaba" yê re xebitîbû. Di van salên dawiyê de jî li Başûrê Kurdistanê dijiya û bi pîrani ji bo AFP (Buroya Agahdariyê ya Fransî) nivîsên li ser rewşa Kurdan û kirinên mêtînghekar

dinivîsand. Bi saya nivîsên wê, bi milyon mirov di derheqa rewşa Kurdistanê de agahdarî werdigirtin û ev jî ji bo wergirtina piştigirîya raya giştî ya gelên cihanê îmkaneke xurt peyde dikir.

Saddam ji mêj ve îlan kiribû ku "Kî yekî/yeka biyanî, nema-ze jî rojnamevanekî/rojnamevanekê bi-

kuje, ew dê bi 10.000 dollar bê xelatkirin."

Beriya nuha bi demekê li du kesên Swêdî Katarina Bjärva û Anders Blomdahl sûtqast hatibû kirin. Anders Blomdahl di vê sûtqastê de ji ser çavên xwe birîndar bûbû. Di 03.04.1994-an de jî dosta Kurdan rojnamevana navdar Lissy bû hedefa terora

Saddam. Dijmin bi kuştina Lissy weha difikire ku ew dê bi karibe rê li piştigirîya ku gelê Kurd ji mirovên mêrxas û bi haysiyet werdigre, bigrin. Lê ev kirinên dijmin, terora ku dijmin li Kurdistanê dike û rewşa ku gelê Kurd tê de ye, pîr eşkere dide diyarkirin. Çavên raya giştî ya cihanê dê bi van kirinan netirse û dijminên Kurdan bi van kirinan bi tenê pêvajoya îzolebûna xwe bi leztir dikin.

Katarina Bjärva piştî kuştina Lissy di rojnameya Dagens Nyheter de nivîsarek nivîsî û di wir de, nivîsa xwe weha diqedîne; "Quweteke mezin bi Lissy re hebû. Lissy ji ber vê quwetê ji bo ku rastîyê-tev li ku rastî zor û tevlihev bû jî- bi gel bide fahmkirin, diket nava hewildaneke bêhempa. Pêwîstiya demokrasîyê û aşîtiyê bi mirovên mîna Lissy heye. Hem rejîma Tirkîyeyê û hem jî ya Iraqê ev rastî baş fahm kiribûn."

YEKÎTÎYA JINAN KOVARA

**"JIN"**

**WEŞAND**



Yekitiya Jinên Kurdistanê îsal pira-niya karê xwe li gor programa xwe ya salane pêk anî û gavên pir girîng avêtin. Yek ji wan, weşandina kovara jin bû. Em dixwazin bi zimanê Swêdî rewşa jinên Kurd bi civata Swêdê bidin naskirin.

Di roja 27-ê Sibatê de li "Medborgarhuset"ê, li ser darsa neteweyî, fundamentalizm û bindestiya jinan semînerê ji aliyê Yekitiya Jinên Kurdistanê, jinên Afganistanê û jinên Îranî ve pêk hat. 70-80 jin û mêr beşdarî semînerê bûn. Lê mixabin di semînerê de tu mêrên Kurd beşdar ne bûn.

Gava ku em wek Y.J.K semînerê yan jî panelekê pêk tînin, em ne ji bo jinên Kurd tenê pêk tînin... Armanca me ew e ku civata Kurd bi giştî, çî mêr çî jin, di van semîneran de beşdar bibin.

Pirsa jinan, di dîtina me de ne pirs a jinan tenê ye... Lê pîrsek civakî, siyasî û giştî ye... Em hêvîdar in ku di rojên peşiyê de em ê mêrên Kurd jî di semîner û panelên xwe bibînin.

YJK bi awakî xurt beşdarî roja 8-ê Adarê bû. Me bi musîk û folklor a Kurdî ve mîting xemiland. Hevala me Ayşe li ser rewşa Kurdistanê axaftinek kir. Em wek yekiti li gel bandrol û pankartên xwe derketin. Me belavokên xwe di meşê de belav kir.

Em Y.J.K.xebat û agahdariyên xwe bi rêya radyoya Komeleya Kurd li Spångayê her heftê carekê belav dikin.

Dû endamên K.K. a Y.J.K di radyoya Komeleya Kurd li Spångayê amade bûn û bersivên guhdaran dan. Her weha em ê wek Y.J.K di roja 07.05.1994-an de semînerê li ser "Tesira dîn li ser civata Kurd û li ser jinên Kurd" pêk bînin. Semîner wê li lokala Federasyonê pêk bê. Ji bo hîljbartina parlamentoyê û ji bo newrozê du nameyên protestoyê ji serokwezîra Tirkîyeyê Tansu Çiller re hatin şandin.

Ji bo ku em dan û stendinên xwe bi endaman re germtir bikin, em ê di roja 07.05.1994-an de li lokala Federasyonê şahiyekê bi endamên xwe re amade bikin; xwarin, vexwarin û muzîk heye. Hemû endam bi xêr û xweşî bîn.

## KILAMEK JI BO BEKO

Xerîbî kirasî hesinî ye.

Di filmê "kilamek ji bo Beko" de, mirov dibîne ku sînemaya Kurdî êdî bi ser piyan dikeve. Kurd di gelek waran de li gora xelkên din yê pêşketî bi şunda ne. Di warê perdeya spî de çend filmên Kurdî hene ku mirov dikare bi pêçiyên bijmêre.

Nizamettin ARIC hem rejisor, hem listikvan û hem filmçêker e. Ew di sala 198-ê de mecbûr ma welatê xwe bi cî hêla û kete nav karwanê rêya xerîbiyê, kirasê ku neqete yê hêsîni li xwe kir û hate Almaniyayê li Berlinê bi cîh bû. Ji bo filmê "Kilamek ji bo Beko" bi binêran re bide û bistîne Nizamettin Arîç hatibû swêdê, li Stokholmê û Göteborgê beşdarî seansên filmê bû. Bersiva pîrsên binêr da.

Nizamettin Arîç di filmê



xwe de rewş û hêviya Kurdan radixe pêşiya çavê xelkê. Rewşa Kurdan ya li welêt derbederbuyin û hêviyên wan û tadeyên xerîbiyê bi awayekî hûnerî ronî dike.

Ji hêla babet û kêşanê de

film, mirov dikare bêje ku dîgêje armanca xwe ya ku dixwaze ji Ewropîyan û cihanê re bêje, di filmê de xweş diyar e.

Diyar e ku kurd ne ji kêfa dilê xwe ji welatê xwe derdi-

kevin.

-Tadeya ku welatê kurda çend perçe ye di de pêş çavan û film bi tevayî gelek xweşik hatiye kişandin û birrîn.

Lê ji bo Kurdan bi xwe di filmê de Kurdî (kurmançî) peyvandinê de mirov nikare bibêje kêmaniyan filmê "Kilamek ji bo Beko" tuneye. Tevlihevkirina nêr û mê, xebêdanên di cihên xelet de û di diyarkirina devokên aliyên Kurdistanê de rexneyên gelek di cî de dikarin bêne pêş. Helbet rexneyên ku bêne kirin ji bo ji holê rakirina kêmaniyan baştirîn rê ye.

Li Ewropayê li gora "BEKO" dibêje, filmê Kilamek ji bo Beko heta nuha (11) yanzdeh xelat wergirtine.

Film 18-ê Adara 1994-an de li Stokholmê li sinemeya Zita-Folket dest pêkir.

## Parlamentoya Swêdê dîsa pîrsa kurdî munaqêşe kir

Parlamentoya Swêdê munaqêşeyên xwe yê li ser pîrsa Kurd di sewiyeyên cuda de didomîne. Parlamentoya Swêdê yek ji wan parlamentoyên Ewropayê yê ku pîrsa Kurd pîr caran lê tê munaqêşkirinê ye. Organîzasyonên dostên Kurdan, heta ji wan tê vê, pîrsê aktuell dihêlin. Parlamenterên ku li Parlamentoya swêdê mîna lobiyeke Kurdan kar dikin jî di her firsetê de pîrsa Kurd bi munasebeta bûyerên cuda tînin rojevê û di vî warî de pîrsan ji wezîrên eleqadar dikin. Di 22-yê Adarê de Ingela Mårtensson û Pär Granstedt li ser rewşa Kurdan, girtina parlamenterên DEPê, hîlbijartinên deverî û mafên mirovî li Tirkîyeyê, ji wezîra Karûbarên Derve ya Swêdê pîrsîn. Li gor protokola Parlamentoyê(1993/94:77) parlamenterê "Center" Pär Granstedt pîrsa, "ji bo ku Tirkîye rîayetî mafên mirovî û prensîpên demokratîk bike, Swêd di nava

Konseya Ewropayê û Konferansa Ewle-yî û Hevkariyê ya Ewropayê de, dikare inisiyativeke çawa bistîne?" ji Margaretha af Ugglas kir. Parlamentera Partiya Gel û seroka Komîteya Swêdî ya ji bo Mafên Mirovî yê Kurdan Ingela Mårtensson jî weha pîrsî; "Ji bo ku li Tirkîyeyê hîlbijartinên demokratîk bikaribe çêbibin, dê Swêd çi bike?"

Wezîra Karûbarên Derve li ser van herdu pîrsan weha got: ....Girtina parlamenterên Partiya Demokrasiyê, awayê danûstendinên bi wan re û cezayê ku ji bo wan tê xwestin, di warê pîrsa Kurd û mafên mirovî de me dixê nava endîşeyekê. Mafê Tirkîyeyê yê ku li dijî terorîzmê şer bike, heye. Lê divê ev di nava çarçoveya prensîpên demokratîk yê dewleta huqûq de bê kirin. Divê Tirkîye bizanibe ku hêza demokrasiyê ji mafê hevvelatîyan yê ku bê ta'de û bi awayekî azad temsîlkarên xwe hildibijê-

rin pêk tê. Gava ev îmkan bîn sînorkirin, demokrasi jî qels dibe. Li gel vê Swêd mesafeyekê dixê navbera xwe û PKK û metodên wê û ji bo çareserkirina pîrsa Kurd jî bi rêya diyalogê çareserkirineke aşîvî hêvî dike. Lê ev bûyerên herî talî şertên çareyê weha zehmet dike." Margaretha af Ugglas got; "ji bo şandina obsevatoran hîn tu daxwaz ji Tirkîyeyê nehatiye" û xwest mîna her-tim prensîpa konsensûsê derxîne pêş.

Pär Granstedt li ser bersiva af Ugglas weha peyivî: "Rewşa Kurdan ya li rojavayê Asyayê di eslê xwe de, trajediyekê neteweyî ye. Ev gel di nava sê dewletan de hatiye perçekirin û hemû dewlet jî di warê hewildanên ji bo bidestxistina huwiyeta neteweyî de xwe li ser ta'deyê konsantre kirine. Di warê siyaseta li Kurdan de zalimiyê pîr mezî hatine kirin. Rast e, terorîzm nayê qebûlkirin û PKK organîzasyonê weha ye ku metodên wê yê xebatê bi tu awayî nikare bê qebûlkirin. Lê avakirin û pêşveçûna Partiya Demokrasiyê pîr eşkere bû ku ji bo peydekirina diyalogê siyasî û bi awayekî mantiqî tatmînkirina daxwazên mantiqî yê Kurdan yê ji

bo qebûlkirina huwiyeta neteweyî û kulturî, hewildanek bû. Tirkîye ev pêvajo rawestand, temsîlkarên Kurdan ji parlamentoyê derxist û bi gelek awayan ta'de li wan kir û bû sebebê ku ew xwe ji hîlbijartinan vekîşîne. Pîr eşkere ye ku ev gav li dij hewildanên ji bo peydekirina prosesê aşîvî ye."

Margaretha af Ugglas diyar kir ku Swêd bi rêya sefirê Ankarayê bi partiyên siyasî yê Tirkîyeyê re di nava danûstendinan de ye. Margaretha weha dom kir: "Nuha du berpirsiyarên Partiya Demokrasiyê hatin em ziyaret kirin û me ew li Wezaretê Karûbarên Derve di sewiyeya dîplomatan de qebûl kir. Em bi vî awayî li Tirkîyeyê bi gelek partiyên siyasî re diyalogê dimeşînin."

Pär Granstedt got ku "Divê ev diyalog bête meşandin û her weha sînyalên ku ji aliye me diçin Tirkîyeyê divê pîr vekirî bin. Di nava endametiya Tirkîyeyê ya li Konseya Ewropayê, hewildanên wê yê ji bo bibê endamê Yekîtiya Ewropayê û refetariya wê ya ku bi van organîzasyonan re li hev nake, paradoksek heye."

## Nûçeyên ji Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê



Komeleya Kurdistanê li Eskilstuna di roja 18-12.93 da kongreya xwe ya 9-em pêk anî. K.K. ya ji bona kar û barên komeleyê hate hîlbijartin di komcîvîna xwe ya yekem da programeke xebatê ji bona 6 mehan (Jan-Juni-94) amade kir. Wek ku di programa xebatê de jî diyar e, pîraniya çalakiyên komeleya me ketine nav meha Adarê. Ji ber ku meha Adarê bi xweşî û nexweşî yê xwe ve, ji bo me Kurdan meheke gelek girîng e. Gelê Kurd di nav vê mehê de bûyerên him xweş û him jî nexweş jî ya ye. Lê, di pêş meha Adarê de komeleya me gelek çalakiyên din jî pêk aniye ku hindêk ji van çalakiyan li jêr hatine nivîsandin.

1- Di roja 01.22.94 de semînerêke bi navê "kurte-behsek li ser rewşa aborî û siyasî li Kurdistanê başûr" pêk hat. Semînergêrê ve semînerê sekreterê P.K.S.K. Macid Rewandûzî bû.

2- Salroja damezrandina Komara Mahabadê hemû salan ji

bal komeleya me ve tê pîrozkirin. Îsal şeva bîranîna salroja damezrandina Komara Mahabadê, di roja 28.01.94 de, bi beşdariya ji sed kesan zêdetir rûniştewanan hate pîrozkirin.

3- Di roja 94.02.20 de semînerêke din li ser rewşa Kurdên Feylî pêk hat. Semînergêrê ve semînarê Dr.Enwer Huseyin bû. Gelek kes beşdarî vî semînarê bûn.

4- Di roja 25.02.94 de, êwêreke Kurdî (Kurdisk träff) ji bona binemalên endamên komeleyê û kurdên li Eskilstuna pêk hat. Çend binemalên endamên komela me beşdar bûn.

Wek ku me di destpêkê da jî diyar kiribû, pîraniya çalakiyên komeleya me di nav meha Adarê de bûn. Di meha Adarê de germî li Kurdistanê dest pê dike, befir hêdî, hêdî dest bi helandinê dike û cihê xwe ji kulîlê biharê re dihêle. Her çend welatê ku em lê dijîn sar be jî lê germiya ku li Kurdistanê bi meha Adarê re dest pê dike,

germiya xwe dide me jî. Lewra em Kurdên li devayî welêt di meha Adarê de çalaktir dibin û gelek çalakiyan pêk tînin. Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê di nav meha Adarê de gelek çalakiyan pêk aniye, hindêk ji van çalakiyan li jêr hatine nivîsandin.

5- Komelaya Kurdistanê, Komîteya Swêdî ya parastina mafên Kurdan, ABF Eskilstuna yê ABF Sörmlandê, Kostfrämjandet li Sörmlandê û Komeleya Y.C. li Katrineholmê bi hevdu re pêşangaheke resim bi navê "Kurdistan Ljus" ji bo 20 rojan (5.2503/94) li salana pêşangah (kongshalen) a ABF li Eskilstunayê pêk anîn. Ev pêşangaha ji wêneyên çend resamên Kurd ku li Kurdistanê başûr dijîn (Namik Hemeferec, Ismail Xeyat û Namiq Ali Qadir) û çend resamên kurd ku li Swêdê dijîn (Biston Abudlla, Necat Serkan û Muzafer Namdarî) pêk hatibû. Herdu rojnameyên Eskilstunayê bi dirêjayî li ser pêşangahê navîsîn û bi sedan kes vê pêşangahê dîtîn. Rojname Kuriren sernivisa "cenneta ku xirakirin" bi kar anîb.

6- Roja Jinên cihanê (8 Adarê). Bi pêşangiya jinên endamên komeleya me, gelek jinên Kurd beşdarê roja jîna cihanê bûn. Jinên endamê komelaya me raxistineke ku ji tiştên karê destî pêk hatibû, danîn û her weha çîrînayî yê kurdî amade kiribûn. Grupa Folklorê a Y.C komeleya me bi kinc û govendên xwe ên xweşik roja Jinan xemilandin. Lewra jî her-

du rojnameyên Eskilstuna resimê wan belav kir û li ser wan weha nivîsîn "Keçên kurd a bi kincên xwe ên xweşik, govendên, çîrokî pêşkêş kirin.

7-Di roja 13.03.94-an de semînerê li ser Helebçe û çekên kîmyawî pêk hat. Dr.Celadet Çeliker ku semîner bi rê va dibir, bi şîweyek zanistî qetlîama helebçe anî zimên û her weha dîsan bi awayekî zanistî û bi dirêjayî li ser wan çekên kîmyawî ên ku heta nuha li Kurdistanê hatine bikar anîn rawestiya.

Jiyan û Goran Mehmûd ku di nav qetlîama Helebçe da jî-yabûn, hîsên xwe û serpehatiyên wê rojê anîn zimên. Rojnameyên Eskilstunayê hevdişînek bi Jiyan û Goran re pêk anî û rojnameya "Kuriren" weha nivîsibû "5000 kes mirin û ji vê zêdetir kes jî birîndar bûn"

8-Bi pêşangiya Komeleya Kurdistanê û Komîteya Swêdî a Parastina mafê Kurdan li Eskilstunayê di gel nûnerên hemû partiyên siyasî yê Swêdî ku di belediyeya Eskilstunayê de tînin temsîlkirin, bi hev re nameyêke protesoyê amade kirin û ji serrokkomar, serok Wezîr, Wezîrê hundur û ji serekê parlamentoya Tirkîyeyê re hat şandin. Ev nameya jî di herdu rojnameyên Eskilstunayê (Kuriren û Folket) de û ji rojnameya Azadî, Ozgur Gundem, Medya Gunesî, Armanç û ji Berbangê re jî hate şandin. Rojnameya "Folket"ê li ser vê nameyê weha nivîsî bû. "Hemû partiyên pîştîwaniya xwe dan Kurdan".

9- Komeleya Kurdistanê li

Eskilstunayê di êvara 20(21 de bi beşdariya 350-400 kesan bi kêf û xweşî agirê Newrozê pêxist.

10- Şeva Newrozê di roja 26.03.94-an de li "Parken Zo-o"yê pêk hat. Ji Eskilstuna û bajarên dora Eskilstunayê nêzîkî 600 kesên Kurd û Swêdî di şeva me de amade bûn. Hunermendên bi nav û deng Tehsin Taha û Fûad Ahmed bi awazên xwe yê xweş, Hunermend Zahid Brifkanî bi dengê kema-na xwe grûpa Helebçe û grûpa Jîr bi musîqa û awazên xwe, her weha grûpa Folklorê ya Seksiyona ciwanên Komeleya me bi govendên xwe yê xweşik şeva me xemilandin. Herdu rojnameyên Eskilstunayê li ser şeva me nivîsîn. Rojnameya Kuriren ji bo şeva me ev rist bi "kar anîbû; "Tu kesên din tune ne ku ji keç û jinên Kurdan xweşiktir kincan li xwe bikin, gava diçin kîncxweşiyê. Perçên kincên wan ji perçên kincên prensesên çîrokan hatine standin"

11- Pêşberkêyêke fûtbolê li roja 3-4-94-an de, di navbera du timê Komeleya Eskilstunayê Katrineholm, Sala, Westerås û Örebroyê de, li Eskilstunayê pêk hat. Di encamê listinê de tima Eskilstunayê "Ararat" bû yekem û diyariya yekem wergirt. Örebro bu bi duyem û diyariya duwemîn, tima Eskilstunayê Newroz bû sêhem û diyariya sêhemîn wergirt.

Komîteya Karger ya Komeleya Kurdistanê li Eskilstuna ye



### پرسی کورد له پهلهمانی سوید دا

هله تیگه‌یشتهوه و نوتنه‌رانی کورد له پهلهمان دهر دهکات و به زور شتیه زولمیان لینه‌کات وادیاریان خو له هله‌لباردن بیویرن. هیچ گومان له‌وه‌دا نیبه که نم کارانه‌ی تورکیا له دژی دوزینه‌وه‌ی ریگه‌چاره‌یه‌کی ناشتیخوازانه‌یه.

مهرگریتا ناف نیگللاس ناماژهی په‌وه کرد که سوید له ریگه‌ی بالوتیری تورکیاوه خهریکی وتوویرت له گهل پارتی سیاسیه‌کانی تورکیا‌یه. نو گووتی: "نیستا دوو کاربه‌دهستی پارتی دیموکراسی هاتون و نیمه‌چاومان پیتیان کهوت و له وه‌زاره‌تی کاروباری دهره‌وه‌دا له باری دیپلوماتیکه‌وه وهرمانگرتن. نیمه‌بم شتیه‌یه له گهل گهل‌تیک پارتی سیاسی تورکیادا خهریکی وتوویرتین.

پهر گرانستید گووتی: "ده‌بج نه‌وه‌وتوویرتانه هه‌روا درتیه‌یان هه‌بج. هه‌روه‌ها ده‌بج نه‌وه‌نیشاره‌تانه‌ی نیمه‌بج تورکیا فره‌کراوه‌بن.

له‌نیوان نه‌ندامیتی تورکیا له شوپای نه‌وروپا و هه‌ولدانی نه‌وان بۆ نه‌ندامیتی له‌یه‌کتیتی نه‌وروپا و، شتیه‌ی جوولانه‌وه‌یان له‌ناو نه‌وه‌ ریگه‌خراوانده‌ا ناکوکی و جی‌اوازیبه‌کی زور دیتته به‌ر‌چاو.

چاره‌سهرکردنیکي ناشتیانه‌وه. به‌لام نه‌وه‌ رووداوه زور تالانه، هه‌لمه‌رجی وه‌ها چاره‌سهرکردنیک گهل‌ت دژوارتر ده‌کهن.

مهرگریتا ناف نیگللاس ویرای گووتی نه‌وه‌ که "بۆ ناردنی چاودیر هیشتا تورکیا هیچ داخوازتی نه‌کردوه." داوای کرد که تورکیا له هه‌ر دم و حالیکدا پرنسیپه‌کانی یاسا له به‌ر‌چاو بگرئ.

پهر گرانستید له وه‌لامی ناف نوگلاندا گووتی: "وه‌زعی کوردان له رۆژناوای ناسیا له (راستیدا تراژیدیا‌یه‌کی نه‌توه‌یی یه. نه‌وه‌ گهل له‌ناو سنی دهره‌تدا پارچه‌پارچه‌ کراوه و هه‌موو نه‌وه‌ دوله‌تانه‌ش له دژی هه‌ولدان بۆ به‌ده‌سه‌پتانی که‌سایه‌تی نه‌توه‌یی کورده‌ا هتیری زوردارانه‌ی خویان به‌کار ده‌خهن. له باری سیاسیه‌وه زولمیتکی زور گه‌وره له کوردان کراوه. راسته‌که ترۆرزم قه‌بوول ناکرئ و (PKK) ریگه‌خراوتکی وایه که شتیه‌ی خه‌باتیان به‌هیچ‌چه‌ش‌ن جیتی په‌سند نیبه، به‌لام پارتی دیموکراسی بۆ دوزینه‌وه‌ی چاره‌یه‌کی ناشتیخوازانه له ریگه‌ی وتوویرتی سیاسی و به‌شتیه‌یه‌کی مه‌نتیقی بۆ به‌دیپتانی داوای ره‌وای کورده‌کان و قه‌بوول کرانی که‌سایه‌تی میلی و کولتوریان تیده‌کوشن. تورکیا نه‌وه‌ به

بگرئ، سوید چۆن ده‌توانی له‌ناو شوپای نه‌وروپا و کونفهرانسی نه‌ولمیی و هاوکاری نه‌وروپادا ده‌ستپیشخه‌ری بکا؟" پهلهمانتاری پارتی گهل و سه‌رۆکی کۆمیتهی سویدی بۆ مافی مرۆفی کورد «نینگلا مۆرتینسون» یش پرسی: "سويد بۆ نه‌وه‌ی له‌تورکیادا هه‌له‌لباردن دیموکراتی به‌رتیه‌بج، ده‌بج‌چ بکا؟"

وه‌زیری کاروباری دهره‌وه له وه‌لامی هه‌ر دوو پرسیاردا گووتی: "گیرانی پهلهمانتاره‌کانی پارتی دیموکراسی، شتیه‌ی ره‌فتار له گهل نه‌وان و سزایه‌ک که بۆ نه‌وان ده‌خوازئ، نیمه‌له‌باری پرسی کورد و مافی مرۆفدا ده‌خاته‌ناو به‌روه. تورکیا مافی نه‌وه‌ی هه‌یه‌که له دژی ترۆرزم شه‌ر بکا، به‌لام نه‌وه‌ش ده‌بج له‌چوارچینه‌ی پرنسیپه‌کانی دیموکراسی ده‌وله‌تیدا بکرئ. تورکیا ده‌بج‌بزانی که هتیری دیموکراسی له مافی نه‌وه‌ هاوولتیه‌ندی که به‌نازادی نوتنه‌رانی خویان هه‌لد‌ه‌بژین، پتیکئ. که نه‌وه‌ نیم‌کانه‌ ته‌نگه‌به‌ر بکرته‌وه، دیموکراسی بۆ هتیر ده‌بج. له گهل نه‌مه‌شدا، سوید سنوریک له‌نیوان خوی و شتیه‌ی جوولانه‌وه‌ی نه‌واندا داده‌ن و هیواداره کتیه‌ی کورد له ریگه‌ی وتوویرتیه‌وه بگاته

پهلهمانی سوید درتیه‌ به‌وتوویرتی هه‌مه‌لایه‌نی خوی له سه‌ر کتیه‌ی کورد ده‌دا. پهلهمانی سوید یه‌کتی له پهلهمانه‌کانی نه‌وروپا‌یه‌یه که زور جارن باس له کتیه‌ی کورد ده‌کا. ریگه‌خراوه‌کانی دۆستی کورد نه‌وه‌ندی به‌توانن نه‌وه‌ پرسانه به‌چالاکی دیتنه گۆرئ. نه‌وه‌ نوتنه‌رانه‌ش که له پهلهمانی سوید وه‌ک پشتیوانی کوردان کار ده‌کهن له هه‌ر دهره‌تیک بۆ باسکردنی کتیه‌ی کورد به‌بیانوی جوړاوجۆر کهلک وه‌رده‌گرن و ده‌یکه‌نه به‌رنامه‌ی پهلهمان و له‌م باره‌وه پرسه‌کانیان ناراسته‌ی وه‌زیرانی پتیه‌نیدار ده‌کهن.

له رۆژی ۲۲ی نادار، نینگلا مۆرتینسون (Ingela Mårtinson) و پیر گرانستید (Pär Granstedt) له سه‌ر هه‌لمه‌رجی کورد، گیرانی شه‌ش پهلهمنتاری پارتی دیموکراتی (DEP)، هه‌له‌لبارده‌کانی هه‌ریمی و مافی مرۆف له‌تورکیا، ریزه‌پرسیاریان ناراسته‌ی وه‌زیری کاروباری دهره‌وه‌ی سوید کرد. به‌گویره‌ی پرۆتوکۆلی پهلهمان (۱۹۹۳/۹۴:۷۷) پهلهمانتاری پارتی سه‌نتر، پهر گرانستید نه‌م پرسیاره‌ی له مافی مرۆف (Margaretha af Ugglas) کرد بۆ نه‌وه‌ی تورکیا مافی مرۆف و پرنسیپه‌کانی دیموکراتی له‌به‌ر‌چاو

### نه‌ورۆز و چالاکی کۆمه‌له‌ی کورد له‌یه‌ئلی

له ریکه‌وتی ۱۹-۳-۹۴دا ناهنگ و جیتی نه‌ورۆز له هۆلی فۆلکت هوسدا گیرا. له‌م شه‌واهنگه‌دا کورده‌کانی دانیشته‌وی شاری (Gävle & Sandviken) و شاره‌کانی دهرانه‌پشت به‌شداریان کرد. هونه‌رمه‌ندانی ده‌نگ‌خوش جودی و میکییل له‌م ناهنگه‌دا به‌شدار بوون. هه‌روه‌ها نوتنه‌رانی ریگه‌خراوه سویدیه‌کان و کۆمه‌له‌ بیانییه‌کان که له لایه‌ن کۆمه‌له‌ی کورديه‌وه بانگه‌پشتان کرابوون، به‌قه‌ردانییه‌وه له‌م ناهنگه‌دا به‌شداریان کرد.

### خویشاندان له دژی تورکیا



له ریکه‌وتی ۲۶-۳-۹۴دا کۆمه‌له‌ی کورد خویشاندانیکي دژی ناکار و کرده‌وه‌ی رژیمی تورکیا به‌رانبه‌ر به‌کورده‌کان و به‌تایبه‌ت گیران و ده‌ست به‌سهرداگرنتی نوتنه‌رانی کورد له پهلهماندا ریکه‌خست. نه‌م خویشاندانه به‌ریتوانیتیک به‌ناو شه‌قاصه‌کانی شاردا ده‌ستی پتیکرد و له کوتاییدا له مه‌یدانی گه‌وره‌ی شاردا کۆبوونه‌وه و وتاری کۆمه‌له‌ی کوردی و په‌یامی پارتی چه‌پ، پارتی گه‌لم که‌مه‌له‌ی کولتوری نیو نه‌توه‌یی، کۆمه‌له‌ی ناشتی خویندرايه‌وه. نه‌وه‌ پارتانه له په‌یامه‌کانیانداندا نازکاری رژیمی تورکیایان مه‌حکوم کرد و خه‌باتی نه‌توه‌ی کوردیان وه‌ک خه‌باتیکي په‌وا و ناشتیخوازانه هتتایه‌ گۆرئ.

### نیساندانی پتیه‌نگه‌یه‌ک

له ریکه‌وتی ۲۹-۳-۹۴دا پتیه‌نگه‌یه‌کی وینه له لایه‌ن (Fritids Andersberg) سه‌ر به‌لاوانی سویدی و بیانی کراوه. له‌م پتیه‌نگه‌یه‌دا چۆنییه‌تی ژبان له کوردستان، به‌تایبه‌ت ژبانی مندالانی کورد به‌وتنه‌ و نوسراوه‌ پتیشان درا. دور لاری کورد به‌ناوی که‌مال عه‌باسی و شوپش قادر له لایه‌ن کۆمه‌له‌ی کورديه‌وه پتیه‌شکه‌ری نه‌م پتیه‌نگه‌یه‌ بوون.

### چالاکی کۆمه‌له‌ی نۆستیرشوند

### نه‌ورۆز

له رۆژی ۱۹ی مارسدا، کۆمه‌له‌ی کوردی نۆستیرشوند به‌بۆنه‌ی نه‌ورۆزی پیرۆزه‌وه، ناهنگیکي گه‌وره و ره‌نگینی ساز کرد. له‌م ناهنگه‌دا نزیکه‌ی ۴۰۰ کس به‌شدار بوون. هه‌روه‌ها مۆسیقای کوردی و سویدی، دانس و سه‌ما، خواردن پتیه‌شکه‌ش کرا. له‌م ناهنگه‌دا مۆسیقاژهن: گروپی نۆستیرشوند (Hugade Harriets) کاره، تیبی هه‌له‌په‌رکتی خونچه‌کانی هه‌له‌بجه، گروپی دانسی تیه‌لندی (Rammthai)، گۆرانییه‌ت که‌یوان ویرای تۆرگۆهن چیا و ... به‌شدار بوون.

### هه‌فته‌ی، نه‌رئ بۆ فره‌هه‌ش

هه‌روه‌ها له‌سه‌روه‌ندی نه‌ورۆزدا هه‌فته‌ی "نه‌رئ بۆ فره‌هه‌ش" لو نۆستیرشوند پتیه‌کات که له‌م هه‌فته‌یه‌دا کورده‌کانی نه‌م شاره‌ش ویرای سویدی و بیانییه‌کانی دیکه‌ چالاکی جوړاوجۆریان نواند. یه‌ک له‌وان له ناهنگی رۆژی شه‌مۆ ۲۶-۳-۹۴ بوو که تیبی هه‌له‌په‌رکتی خونچه‌کانی هه‌له‌بجه چالاکانه به‌شداریان تیتیدا کرد و پتیه‌شکه‌شکه‌ی باشیان لیکرا. نه‌م تیبی له شه‌ش کیژ و کورپی لاری کورد پتیه‌کاتوه.

هه‌روه‌ها له درتیه‌ی چالاکیه‌کانی نه‌رئ بۆ فره‌هه‌ش، هه‌ر نه‌وه‌ تیبی قوتابیه‌کانی پۆلی شه‌شی قوتابخانه‌یه‌کی سویدیان (Kastalskolan) فیری هه‌له‌په‌رکتی کوردی کرد. دوو قوتابی کوردی نه‌وه قوتابخانه‌یه: خه‌بات نوسمان و حه‌لیمه‌ حه‌سه‌ن نه‌ندامی تیبی خونچه‌کانی هه‌له‌بجه‌ن.

رۆژنامه‌کانی نه‌وه‌ شاره (Länstidningen, Östersunds-Posten) به‌درتیه‌ی له سه‌ر نه‌وه‌ چالاکیانه راپۆرت و وتاریان بلاو کرده‌وه.

«نه‌رئ بۆ فره‌هه‌ش» سه‌ن سال له‌مه‌وه‌به‌ر دامه‌زرا و مه‌به‌ستیشیان له‌م ریگه‌خراوه‌ ده‌رفه‌ت دانه بۆ هه‌موو کولتوره‌ جی‌اوازه‌کان تا به‌توانن چالاکی خویان پتیه‌شکه‌ش بکه‌ن. زۆریه‌ی هونه‌رمه‌ندانی نه‌وه‌ شاره‌ هاریکاری نه‌وه‌ ریگه‌خراوه‌ ده‌کهن، نانسا نیلسون (Ansa Nilsson) له به‌رتیه‌به‌رانی «نه‌رئ بۆ فره‌هه‌ش» پتی وایه که پتیه‌سته وینه‌یه‌کی راسته‌قینه له کولتوره‌ جی‌اوازه‌کان به‌درتیه‌ سویدی و په‌نابه‌ره‌کان. نه‌وه‌ ده‌لتی: "به‌تایبه‌ت منداله‌کان ده‌بج نه‌زادیان بناسن، بزانت له کوتوه‌ هاتون، مرۆف نه‌گه‌ر ریشه‌کانی خوی لئ گوم به‌ن، فره‌ دژواره‌ که له داها‌تووی خوی دلتیا به‌ن."



### چالاکي کۆمهلهکان

#### کۆمهلهی ئيسکليستونا

رۆژي 18-12-93 کۆنگرهی نۆهه می کۆمهلهی ئيسکليستونا پينکها و کۆمیتتهی کارگير بۆ بهرپوهبردی کاروبارهکان هاته ههلبژاردن. له يه کم کۆبوونهوی کۆمیتتهی کارگيردا، بهرنامهیهکی تیکۆشانی شهس مانگه (يانواری - یونی 94) پهسند کرا. وهک له بهرنامهی خهبات و تیکۆشاندایاره، زۆرهی چالاکیهکانی ئیتمه له مانگی رهشه مهدا رنگی داوه تهوه، چونکه لهم مانگه دا زۆر رووداو و کارهساتی خوش و ناخوش بۆ نه تهوه که مان هاتۆته پيش و بۆ کورد مانگیتکی گه لێ گرینگه. کۆمهلهی ئیتمه له سن مانگی رابردوودا و به تایبتهی له مانگی رهشه مهدا چالاکي جۆره جۆری نواندوه که لێره باس دهکرتین:

\* رۆژی 22-1-94 له سیمیناریک به ناوی "کورت بهاسیک له سهر باری ئابووری و سیاسی کوردستانی باشوور" دا بهشداري کرد. ئهم سیمیناره له لایهن مهجید رهواندووزی سکرتیرتیری (پ.ک.س.ک) وه پینکها تبوو.

\* رۆژی 28-1-94 بیره وهی دامهزرانی کۆماری کوردستان له مههاباد، به بهشداري پتر له سه دهس ریزی لێ گهرا و پیرۆز کرا.

\* رۆژی 20-2-94 سیمیناریک سهبارته به

لاوانی کاترینه هۆلمهوه به شیهویهکی هاو بهش پيشانگایهکی نیگارکیشان به ناوی "روونا کایی کوردستان" بۆ ماوهی بیست رۆژ له 5-1-94 تا 25-1-94 له سالتزی پيشهنگه "ABF" کردهوه. ئهم پيشهنگه به نیکار و وینهی چه ندين هونهرمهندی کوردی کوردستانی باشوور (نامیق همه فه رج، سه میل خهبات، نه جات سه رخا و موزه فه ری نامداری)

رازایه وه. ههر دوو رۆژنامه کانی ئيسکليستونا له سه ریان نووسیبوو. لهم ماوه یه دا سه دان کهس سه ری پيشهنگایان دا. رۆژنامهی "گوریتین" سه روتاری خۆی به ناوی "ته وه به شه شه تی وا و تیران کرا" بۆ ئهم پيشهنگه به ته رخا ن کرده بوو.

\* 8 مارس، رۆژی جیهانی ژنان به شکۆیهکی ته وا وه پیرۆز کرا. لهم ئاههنگه دا که ژنانی ئه ندامی کۆمهلهی ئیتمه ریکیان خسته بوو،



ژماره یهکی زۆری ژنی کورد بهشدار بوون. ژنانی کۆمهله به نیشان دانی کاری دهستی و دروستکردنی شیرنی کوردی، میواندارییان کرد. گروپی فۆلکلۆزی بهشی لاوانی کۆمهله کهش به هه لپه رکێ و شادیی رۆژه که یان خوشتر کرد. ئهم ئاههنگه له ههر دووک رۆژنامه ی شاردا دهنگی دایه وه و وینه کانی چاپ کرا.

\* له لایهن کۆمهلهی کوردی ئيسکليستونا، کۆمیتتهی سویدی دیفاع له مافی کوردان و نوینه رانی پارته سیاسییه کانی سویدی که له شاری ئیتمه دا کاربه ده ستان، نامه یهکی رهخه و ناره زایی نامه کرا که بۆ سه رۆک کۆمار، سه رۆک وه زیر و په رله مانی تورکیا نیت درا. دهقی ئهم نامه یه بۆ رۆژنامه کانی ئيسکليستونا ناردا. رۆژنامه ی (Folket) نووسیه: "ته واوی پارته کان پشتیوانیان له کوردان کرد."

(ئه و نامه یه له لاپه ره ی 6 دا چاپ کرا وه)

\* نێواره ی رۆژی 3-4-94 پيشهنگه یهکی فووتبۆل له نێوان تیهه کانی کۆمهلهی ئيسکليستونا و کاترینه هۆل،، سالا، فیتستۆس و نۆزیتیرۆ پینکها. له ئاکامدا تیهی ناراراتی کۆمهلهی ئيسکليستونا یه کم، نۆزیتیرۆ دووه م و تیهی نه ورۆزی ئيسکليستونا سته م ده رجوون و خه لاتی خۆیان وه رگرت.

\* رۆژی 13-3-94 له سه ره له بجه و چهکی کیمیاوی سیمیناریک پینکها که له ودا دوکتور جه لاد هت چه لیکر به شیهویهکی زانستیانه و به دریزی سه بارته به کوشتاری هه له بجه و ئه و چه که کیمیاویانه ی که له کوردستان به دزی کورد تا قی کراونه ته وه، دوا. ژیان و گۆزان مه محمود دوو لاوی کورد که شاهیدی کوشتاره



کورده فهیلییه کان پینکها. ئهم کۆبوونه وه یه له لایهن دوکتور نه نوه ره حوسین پینکها تبوو که ژماره یهکی زۆری خه لک بهشداریان تیه دا کرد.

\* رۆژی 25-2-94 نێواره یهکی کوردی هاته چیتکردن که ژماره یهک له به نه ماله و کوردی دانیشه توری ئيسکليستونا بهشداریان تیه دا کرد.

\* له لایهن کۆمهلهی ئيسکليستونا وه، کۆمیتتهی سویدی بهرگری له مافی کوردان "ABF" ی ئيسکليستونا، "ABF" ی سوورملا ند و کۆمهله ی

#### کۆمهلهی نويسالا

به بۆنه ی جه زنی نه ورۆزه، کۆمهله ی کوردی له نويسالا چه ندين چالاکي پيشکesh به کورده کانی ئهم شه ری کرد. بوخته یهک له چالاکیهکانه له رۆژه ی نیشاره یان پینکرا وه:

\* رۆژی 18 ئادار رادیۆی کوردی کۆمهله ی کوردستان و بۆ ماوه ی دوو سه عات و تیر بهرنامه یهکی تایبته ی به بۆنه ی جه زنی نه ورۆزه پيشکesh کرد.

\* نێواره ی 20 ئادار، به نامه بهرینی ژماره یهکی زۆر له کورده کانی دانیشه توری ئهم شه ره، ناگری نه ورۆز کرا وه.

\* کاترینه ی 9 نێواره ی هه مان رۆژ ئاههنگیتکی بهر خوش پيشکesh کرا. سه ره تا به دهقی یهک وه ستان بۆ گه یانی یهکی شه هیدان ئاههنگه که کرا وه، یاشان سه رده ی ئه ی راقیب پيشکesh کرا، پرۆگرامی دواتری ئاههنگه که بهر ته ی بو له: ئازان و هه لپه رکیتي لاوان به بهشداري هونهرمه ندان سه کاییل، ده لال، سه عید یوسف، ته حسین ته ها و فواد ته حه مده.

ته وه ی شایانی با سه ژماره یهکی زۆری له کورده کانی دانیشه توری نويسالا نامه ده بوون و ئاههنگه که نا کاترینه ی 1.5 ی شه ره بهر ته یام بوو.

### چالاکي کۆمهلهکان

بهرنامهیهکی هونهری و سیاسی - ئهدهبی که له سهر کاسیت تۆمار کراون، به ناوی کۆمهلهی ئۆرتیرۆ لهم کاناله بلاو کراونهتوه که دواترینیان ناههنگی ئاگرکردنهوی شهوی نهورۆز بوو. کۆمهلهی کوردی له ئۆرتیرۆ دهتوانی پرۆگرامی خۆی دوو جار له ههفتهدا ههرجارهی بۆ ماوهی سهعاتیک بلاو بکاتهوه. لهم بارهوه کۆمهلهی کوردی ئۆرتیرۆ چارهروانی هاوکاریی و یارمهتی ههموو لایهکه.

\* رۆژی 5-4-94 له کارهساتنیکي ماشیندا که له نزیک قامیشلی له کوردستانی سوریا رویدا، 16 کوردی سهرنشینی ماشینهکه کوژران و 12 کهشیش بریندار بوون. یهک لهو کهسانهی گیانی خۆی لهم کارهساتهیدا له دهست دا، کاک سالح عهبدولرهحمان ئهندامی کۆمهلهی کوردی ئۆرتیرۆ بوو که بۆ چارپێکهوتنی باوکی چووبۆوه سوریه. ناوبراو سالهها له شۆرشێ کوردستانی باشووردا پێشمهگره بووه و لهم دوایانهدا بۆ دهرمانی چاری که له شهڕی کوردستاندا بریندار ببوو، هاتبوه سوید. له کاک سالح ژینیک و مندالتيکی ههشت مانگانه به جێ ماوه. لهم پێوهندییهدا دانیشتنی سههرهخۆشی بۆ ماوهی دوو رۆژ له لوکالی کۆمهلهی ئۆرتیرۆ هاته چێکردن.

### کۆمهلهی ئۆرتیرۆ

\* شهوی نهورۆزی 1994 له لایهن کۆمهلهی ئۆرتیرۆ به رێ و رهسسی ئاگرکردنهوه به بهشداریی ژمارهیهکی زۆری کورد و سویدی دانیشتیوی ئهم شاره له ناچهی "ههستههاگن" بهرپهوه چوو. لهم شارهدا کوردهکان به خۆتندنی سرودی تهتهوايهتی ئهی رهقیب و سرودی نهورۆز و ههلهپهركێ له دهوری ئاگرهکه، بهروپیری سالی تازه چوون.

ههروهها له رۆژی 27-3-94 ناههنگی نهورۆز به بهشداریی کوردهکانی ئۆرتیرۆ و ژمارهیهک سویدی له بارهگای کۆمهله پیرۆز کرا. لهم ناههنگهدا پاش پهیامی پیرۆزیایی، دوو شانۆ له لایهن کۆمهلهی لاوانهوه پێشکەش کرا و کۆری سرود و گۆزانی و ههلهپهركێ وهک ههمیشه جهژنهکیان پتر رازاندهوه. بهرپرسی کانالی تهلهفزیۆنی ئۆرتیرۆ که بهشداری ناههنگهکه بوو، دواي پیرۆزیایی، نامادهی خۆی بۆ هاوکاری و بلاوکردنهوی پرۆگرامی تهلهفزیۆنی کۆمهلهی کوردی ئۆرتیرۆ راگهیاندا.

\* ماوهی سالتیکه ئهو دهههتانه بۆ کۆمهلهی کوردی له ئۆرتیرۆ پێکهاتوه که پرۆگرامی جزاوجز له کانالی تهلهفزیۆنی ئۆرتیرۆ بلاو بکاتهوه. ههتا ئیستا چهند

### ئاگاداری یهکیتیی

### ژنانی کوردهستان - سوید

یهکیتیی ژنانی کوردهستان، ئهمسال زۆریه کارهکانی خۆی به گۆریه پرۆگرامی سالانهی بهرپهوه برد و گهلی ههنگاری گرینگی ههلتاوه. یهکن لهوان بلاو کردنهوی گۆفاری "ژن" به زمانی سویدی بوو ههتا ژنی کورد به کۆمهلی سویدی بناسیتن.

له رۆژی 27 فیهربواری له لوکالی (Medborgarhuset) دا له بارهی دهرسی نهتهوهیی، فۆناملتتالیزم و بندهستی ژن، سیمیناریک له لایهن یهکیتیی ژنانی کوردهستان، ژنای ئهفغانستان و ژنانی ئیترانهوه پێکهات. لهم سیمینارهدا 80 ژن و پیاو بهشدارییان کرد که چی بهداخوه ههچ پیاوتیکی کوردی تێیدا بهشدار نهبوو. کاتی ئیمه سیمیناریک پێک دێتین تنیا رومان له ژنهکان نییه، نامانجی ئیمه ئهوهیه که کۆمهلی کوردی به گشتی چ ژن و چ پیاو تێیدا بهشدار بن. کیشهی ژن له روانگهی ئیمهوه، تهنها له سهر پیاوهکانی کۆمهلی نییه، بهلکو کۆمهلی، سیاسهت و باری گشتی دهگرتهوه. ئیمه هیوادارین له داهاتوودا پیاوهکانی کوردیش له ناو سیمینار و پانیهکانی خۆماندا ببینن.

\* له رۆژی 8 ئاداردا یهکیتیی ژنانی کوردهستان به چالاکي و ههتیکي زۆرهوه بهشدارییان له کۆبوونهوی تایهتی ئهو رۆژهدا کرد. ئهم کۆبوونهوهیه به موسیقا و فۆلکلۆری کوردی دهست پێکرا و پاشان ههفال نایشه له سهر وهژی کوردهستان به گشتی دوا و داواکارییهکانی ئیمه به میللتهی سویدی راگهیاندا و وشیاربوونی ئیمه سەلماندا. ئیمه وهکو یهکیتیی ژنانی کوردهستان به دروشم و یلاکاری خۆمان بهشدار بووین و بهیاننامه و راگهیهندراوی خۆمان لهو کۆبوونهوهیهدا بلاکردهوه. سهرحهم 150 - 110 ژن و پیاوی کورد لهم رێ و رهسمهدا بهشدار بوون.

ئیمه یهکیتیی ژنانی کوردهستان چالاکي و ئاگادارییهکانی خۆمان له رێگهی رادیوی کۆمهلهی کوردی له سهپۆنگا بلاوهکهینهوه. له یهکیتیک له پرۆگرامهکاندا دوو ئهندامی کۆمیتهی کارگێری یهکیتیی ژنانی کوردهستان له رادیوی کۆمهلهی سهپۆنگا ناماده بوون و وهلامی گۆنهرهکانیان داوهوه.

\* یهکیتیی ژنانی کوردهستان له سهر مهسهلهی ههلبژاردنی پههلهمان و نهورۆز دوو نامه رهخهگرانهی بۆ سهرۆک وهزیرانی تورکیا "تانسۆ چیلهر" نارد.

\* یهکیتیی ژنانی کوردهستان له رۆژی 7-5-94 سیمیناریک له سهر "کارتییکهری نایین له سهر کۆمهلهگای کورد و ژنی کوردی" له بارهگای فیدراسیۆن پێکهاتن.

\* ههروهها بۆ گهرم و گوپ راگرتنی پێوهندی له گهلی ئهندامانی یهکیتیی ژنانی کوردهستان ئیمه له رۆژی 17-4-94 له لوکالی فیدراسیۆندا مهجلیسیکی شادی بۆ ئهندامان پێک دێتین که لهویدا خواردن و خواردنهوه و موسیقامان دههین. ههر له ئیستاوه بهخهتیهاتی ههموو ئهندامهکان دهکهن.

### کۆمهلهی سوندسفال

\* رۆژی 26-3-94 ناههنگی نهورۆزی پیرۆز به بهشداریی ژمارهیهکی زۆری کوردهکانی شار و ناچهی دهروویهر و میوانی سویدی و بیانی پێکهات. ههر دوو گۆزانییهتی بهناویانگ "دهلال" و "نهجمه" ئهم ناههنگهیان خۆشاندا و به گۆزانی رهسهنی کوردی جهژنهکیان پر له ههلهپهركێ و شادیی کرد.

### کۆمهلهی کورده له ئۆمیشۆ

\* رۆژی 12-3-94 کۆمهلهی کوردی له ئۆمیشۆ ناههنگی نهورۆزی بهریا کرد که لهویدا گۆزانییهتی "دهلال" بهشدار بوو. ژمارهیهکی زۆری کوردی دانیشتیوی ئهم شاره و چهند میوانتیک، ناههنگی نهورۆزیان پیرۆز کرد و لهوایدا تیبی موسیقای کۆمهله به گۆزانی و ناوازی خۆشی کوردی شهوهکیان پتر رازاندهوه.

### کۆمهلهی کارلستاد

\* کۆمهلهی کارلستاد له رێکهوتی 16-3-94 دا یادی کارهساته دلتهزتهکهی ههلهبهجی کردهوه و پرۆگرامی ئهو یاده بهم شیوهیهی خوارهوه بوو:

- \* دهقیقهیهک وهستان بۆ شههیدانی رێگهی نازادی.
- \* سرودی ئهی شههیدان له لایهن تیبی هونهری کۆمهلهوه.
- وتاریک له سهر کارهساتی ههلهبهجه.
- \* پێشکەشکردنی فیلمتیک له سهر کارهساتی ههلهبهجه به زمانی ئینگلیزی.

ئهوێ شایانی باسه ئهو یاده زیاتر له یهک کاتزمتیری خایاند و، 50 کەس بهشداریان تیدا کرد.

### سیمینار

له رۆژی 7-5-94 دا سیمیناریک له بارهگای فیدراسیۆنی کۆمهله کوردهستانیهکان ساز دهین که ناوهڕۆکهکهی لهم دوو بهشه پێکهاتوه و له لایهن بهرپۆز "رۆکن" مستۆزه بهرپهوه دههین:

- 1- کارتییکهری نایین له سهر کۆمهلهگای کوردبواری
  - 2- کارتییکهری نایین له سهر ژناندا.
- ههموو لایهکتان بهخهتیر بێن

### یهکیتیی ژنانی کورده له سوید

شوێن: بارهگای فیدراسیۆن (ST. Eriksgatan 33B, kod 0324)

رێکهوت: 7-5-1994 (1994.05.7)

کاتزمتیر: بهگی نیوهرو (kl: 13.00)

### هاوڕێناسی بهرپهوه

کۆمیتهی بهرپهوه به هاوکاری و بهشداری پارته سیاسییهکانی سویدی له رۆژی 24-4-1994 دا کۆبوونهوهیهک سهبارته به ههلبژاردن له سوید ناماده دهکات. لهم کۆبوونهوهیهدا ئهو پارته سهبارته به سیاسهت و پرۆگرامی خۆیان زانیاری پێشکەش ئاراستهی بهشداران دهکهن.

به بهشداریان خۆشحال دههین. به خهتیر بێن.

رێکهوت: 24-4-1994

کاتزمتیر: 1.5 تا 5.5 پاش نیوهرو (kl 13.30 - 17.00)

شوێن: بارهگای فیدراسیۆن

(S.T Eriksgatan 33B - kod: 0324)



# ریبانگ

F. DEMIRCIOLU  
SALTVEGGSV. 9B  
284 00 BLOMSTERMÅLA

MARKNADSTIDNING B



ATER AVSÄNDAREN

100 28 Stockholm

BERBANG  
Box 490 90, 100 28 Stockholm.

ئۆرگانى فیدراسیۆنى كۆمهله كوردستانیهكان له سوید

Tel (46) 8- 652 85 85



Fax: (46) 8- 650 21 20

بەربانگ ژماره (95) خاكه لێوه (نەپریل) 1994

## ئاهەنگى نەورۆز له كۆمهلهكاندا

ئەنجامى هەلبژاردنى هەريئيمى

له توركيا

له مۆسكۆدا كورد چى به سەر دى؟

يهكيتى ژنانى كوردستان له سوید

گۆرانیهك بۆ بهكو

سامى عەبدولرەحمان ميوانى

نەورۆز



كۆمهلهى ئيسكليستونا



كۆمهلهى ئيسكليستونا



كۆمهلهى ياقلى



كۆمهلهى ئۆستەرشۆند